Jîn

Jimara 12 | Heyva Nîsanê 2007 | Vercinye, Emrîke | perê - 1

Êk ji cejinêt mezin li Emrîke "Cejina Rabîna 'Îsayê Mesîẗ" e. T̈ikmeta Emrîke îcaze ji şulê hey, dêr program u stran yêt teybet yêt heyn, u miruv diçin mala êk u dû bu şîvek xuş.

Li hemandem, wek Cejina Deykbîna 'Îsaî, Cejina Rabîna 'Îsaî bî demê çûna sîkê u demê kirrînê. Gelek Emrîkî mebesta rast ya Cejina Rabîna 'Îsaî nizanin. Mebesta wê kêvirîşk u hêk u çiklêt u cilkêt nî u pêlavêt nî nîne. Belê, mebesta wê 'Îsa ye, u 'Îsa yê Rizgarker yê dinyayê.

Bîne bîra xu – çîroka heyva çûî – pêẍember Musa Cihî ji destê Fir'ewnî xilas kirin. Demê Musaî u Cihîa berxa qurban kirin u xwîna berxa ser dûmelbena u serdera malêt wan, Xudanî xwîn dît u "derbaz bî" malêt wan u ne çû jur ve malêt wan u

kurrêt wan yêt nexirî ne kuşt. U ji ber hindê navê cejinê "Derbazbîn" e. Navê wî berxe ku qurban kirî (u xwarî) "Berxê Derbazbînê" bî.



Yuẗenna pêẍember ji berî 'Îsaî bî. Wî beẗsa 'Îsaî u gute xelkê, "Ew Berxê Xwidê ye. Ewê gunneha dinyayê radikit."

Cejina Rabîna 'Îsayê Mesîẗ temamkirnê Cejina Derbazbînê çunku 'Îsa – miruvek temam u ne gunnehbar – bî Berxê Derbazbînê, qurbane bu ẗemî dinyayê. Tu dişêî çîroka rast ya Cejina Rabîna 'Îsayê Mesîẗ li pera 3 bixwînî.

Buçî Cejina Rabîna 'Îsayê Mesîẗ gring e? Gring e çunku mirin u veşartin u rabîna 'Îsayê Mesîẗî binyat e Incîlê li ser avakirî ye. Buçî? Dû mebest in:

(1) Heker 'Îsa – berxê qurbanê temam bu gunnehêt me - ne mir, ye'nî hêşta me da qurbanêt gîanewera kirî ban. Xwîna ga u berxa gunnehêt xelkî *na*bit. Çunku Xwidê gut xelkê qurbana gîanewera bike, belê ji ber bawerîa miruva u ta'eta Xwidê, Xwidê gunnehêt wan burandin. Belê xwîna qurbanekê temam – ya miruvek ne gunnehbar bî – gunnehêt me dibit heker em qebîl bikîn. Ew miruvê bê gunneh 'Îsa ye. U heker em bawerîê bi 'Îsaî bînîn, belê dê gunnehêt me burit u dê bu me jîana her u her bit.

(2) Heker 'Îsa piştî mirnê ne rabî ba, belê Filehatî da bit temam wek ẗemî dînêt dî – pêẍemberêt wan yêt mezin mirî ne. Belê bi şîanê Xwidê, 'Îsa ji mirnê li roja sîê rabî u evroke sax e!

Qurtalkirin ji gunnehêt me wek dîarî ye. Heker tu dîarîekê bidî min u heker ez venakim u qebîl nakim, ye'nî çawa bu min baş e? Ez nizanim ew çi ye u keyfa min naêt. Belê, heker ez dîarîa te vedikim u qebîl dikim, ya min e. Dîarîa Xwidê bu me jî wek êk e. Dîarîa Xwidê bu me xilaskirin ji gunnehêt me ye. Xwidê ev dîarîe daî ye me bi rêka qurbankirna 'Îsaî li ser xaçê – ew Berxê Derbazbînê temam. T̈eta em dîarîê qebîl ne kîn, nabit ya me.

Cejina Rabîna 'Îsayê Mesîẗ pîruz bit!

"Jîn" guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@csçom
© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.